

Nûçe û Çalakî

## Birêz Derwêşê Derwêş Bi cavsorî hate cezakirin!!

Nûçe û Çalakî

Diho, roja yekşembê 22ê Avdarê, ji ber xebata wî di ber ziman û toreya kurdî de, ji ber xwedîderketina wî li zimanê dayika wî, nivîskar û zimanzanê Kurd birêz **Derwêşê Derwêş** ji bal dadgeha leşkeriya **Qamişlo** ve bi 3 meh zindan û 50î hizar pereyên Sûrî hate cezakirin. Ji ber rewşa wî ya tenduristî ya taybet, zindankirina wî sivik kirin, daxistin 13 rojan, wan rojên ku berî niha di zindanê de derbas kiribûn.

Mixabin ku îro rewşenbîr û torevanên Kurd, di sedsala 21an de, ji derveyî hemî perensîpên mafên mirov û yasayên navnetewî, ji ber xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê zikmakî têne darizan û cezakirin. Bi rastî, ev reng-têkiliya dewletan bi gelên xwe re ji bilî Sûriyê û Îranê li tu dever û welatan nayê dîtin.

Em dixwazin ji berpîrsên dewletê re bibêjim: Eger hûn di wê gumanê de ne ku bi van biryarên cezakirina çalakvan û rewşenbîran û fermanên qedexekirina zimên, wê zimanê Kurdî ji holê rabe û gelê Kurd bi hêsanî bê pişaftin, hun gelekî şaş in!! Gelê Kurd ku bi hizarên sala ye bi zimanê xwe dijî, zimanê dayika di jiyana xwe ya rojane de bikartîne, ziman , hest û giyanê wî bi hev re hatine hûnan, tucarî ew ji hev nayên veqetandin, ango, ta ku Kurdek li ser axa welatê xwe bijî, dê ala zimanê Kurdî berz û bilind be, dê bi vî zimanê şêrîn bê axaftin, pê xwendin û nivîsandin berdeyam be.

Wê pir baş be, li xêra welatê me Sûriyê be ku karbidestên dewletê zimanê Kurdî serbest bikin, van qeyd û bendan ji ser rakin da ku ew jî li kêleka zimanê Erebbî, Siryanî, Ermenî...jiyana xwe ya normal bijî. Herweha em di wê baweriyê de ne ku tu berjewendiya gelê Sûriyê, ne jî ya

destelatê di berdeyamîya vê siyaseta tund û hişk ya dijî gelê Kurd û zimanê wî heye!!.

Em vê biryara cezakirinê ya derheqê birêz Derwêşê Derwêş şermezar dikin, ji ber ku cezakirina rewşenbîran, cezakirina çand û ramanê ye, cezakirina mafê nerîn û derbirînê ye!  
**23.03.2009 Z-2621K**

**Ismayîl Umer**

**Axavkerê Fermî Yê Encumena Giştî Ya Hevbendiya Demokrat Kurd Li Sûriyê**

\*\*\*\*\*

### Heval Husên Koro ji nav me barkir

Li welatê xerîbiyê, Almaniya, di 18-04-2009 an de, heval Husên Koro çû ser dilovanya xwe.

Ew di sala 1965 ar de, li bajarê Qamişlo ji daiyk dibe.

Di sala 1993 an de, ji ber belavkirina daxuyana li ser zagona serjimara awerte, ew û gelek hevalên xwe yên ji **Partiya Yeketî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê "YEKÎTÎ"** têne girtin . Ji ber zordariya rijîma Sûriyê û astengiyên jiyana rojane, ji neçarî goçberî welatê xerîbiyê dibe. Di 26-04-2009 an de, Termê heval Husên digihe Qamişlo, bi beşdariya xwedî, heval, hogir û hêzên Kurd tê veşartin. Li ser gornê, sê gotin , yek ji aliyê serokê Partiya Yeketî ya Demokrat A Kurd li Sûriyê "YEKÎTÎ", Ismaîl Omer , ya din ji hêla dostekî ve û ya siyem ji hêla malbata wî ve pêşkêş dibin.

Bi navê komîta rêvebir ya belavoka NWEROZê û xwedevanên wê, em serê xwedî, heval û hogiran saxdikin.

